Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1198 | 25-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Min ji tenekeyek tembûrek çêkir’



Navenda Nûçeyan

Gabar Nas yê ku bixwe fêrî tembûrê bûyî, destnîşan kir ku her malbateke Kurd pêwîste zarokên xwe li ser çanda Kurdewarî mezin bike û got: “Min ti perwerde li ser lêdana tembûrê nedîtiye, tenê di mejiyê xwe de ez dengê tê lêxistin ji ber dikim û lêdixim. Ji ber bê derfetiyên penaberiyê heta demek dirêj min nekarî ez bibim xwediyê tembûrekê. Min ji tenekeyek run tembûrek ji xwere çêkiribû.”

Xeyalên gelek zarokên penaber di berîkên wan yên dirayî de li ber bayê êşên penabertiyê ketin û bûn êşek di dilê wan de. Hinek ji wan xeyalan jî mîna êş û têkoşîna wan zarokan li berxwedan û bûn parçeyek biçûk ya çanda Kurdewarî. Gabar Nas jî yek ji wan zarokê penaber ên ku nikarîbû ji ber bê derfetiya penaberiyê xeyalên xwe di himbêza xwe de mezin bike. Lê rûxmê hemû bê derfetiyên jiyanê hewl da ku mîna herkesê li tembûrê bixe. Gabar Nas ku niha li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) jiyan dike li ser jiyana penaberî û lêxistina tembûrê axivî.

**‘Mirov çi bixwaze dikare bike’**

Gabar Nas di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku zarokatiya wî di nava penaberî û bêderfertiyên jiyanê de derbas bûye û got: “Em wek malbat di sala 1992’an de ji ber zilm û zordariya dewleta Tirk neçarî penaberiyê bûn û em derbasî wargeha Zelê bûn. Tevî ku em 20 malbat li wê wargehê diman jî, di rojekê de 52 balafirên dewleta Tirk wargeh bombebaran kirin. Wê demê jin û zarok jî di nav de 7 kes şehîd bûn. Ji ber wê êrişê em derbasî nav penaberên Bakurê Kurdistanê yên li wargeha Etrûş bûn. Dema min di weşana ‘Med tv’ kilîbên hevalan û hunermendên Kurd dîtin, mereqa min ya ji bo lêxistina tembûrê pêşket. Bi taybet jî dema hozan Diyar li tembûrê dida, ez gelek bandor dibûm. Ji bo vê min jî ji tenekeyek ya rûnê tembûrek ji bo xwe çêkir. Dibe ku tam neşibiyabe tembûrê, lê dema min destê xwe li serve bir û dianî deng jê hat, ew deng baweriya min bi min anî. Mirov çi bixwaze dikare bike.”

**‘Min ti perwerdeyek li ser lêdana tembûrê ne dîtiye’**

Gabar di berdewamiya axaftina xwe de daxuyakirin ku heta niha ti perwerdeyek di derbarê lêxistina tembûrê de nedîtiye, bi hewldanên xwe fêrî lêxistina tembûrê bûye: “Min bi stirana ‘Bûkê delalê’ xwe fêrî lêdana tembûrê kir. Erê tembûra min ne mîna tembûrên din bû, lê kêmek be jî deng dida. Wê demê ne derfetê me hebûn em tembûrekê bikirim, ne jî çûyîn û hatina derveyî wargehê hebû. Min ti perwerdeyek li ser lêdana tembûrê ne dîtiye. Tenê di mejiyê xwe de ez wî dengê tê lêxistin ji ber dikim û lêdixim. Ji ber bê derfetiyên penaberiyê heta demek dirêj min nekarî ez bibim xwediyê tembûrekê. Hevalek min dizanî ku ewqas mereqa min ji bo tembûrê heye, ji min re tembûrek diyarî anî ez gelek sipasiya wî jî dikim. Dema min dît wî hevalê min ev tembûr ji bo min diyarî da, min got pêwîste ez bibim layîqê vê tembûrê. Min got çi dibe bila bibe pêwîste ez xwe fêrî vê tembûrê bikim. Niha jî ez li tembûrê dixim, zarokên min jî stiranan dibêjin. Dibe ku em ne di asta kilîb çêkirinê de bin, lê di nava civat, malbat û hevalên xwe de em hewl didin bi stiranê xwe rengek cûdatir bidin civatên xwe.”

**‘Zarokên xwe li ser çanda Kurdî perwerde bikin’**

Gabar Nas di dawiyê de bang li hemû malbatên Kurd kir ku zarokên xwe li ser çand û hunera Kurdî perwerde bikin: “Dema em ji welat derketin ez zarok bûm, niha jî 40 salî me. Em hêvîdarin, emê bi hêza şervanên azadiyê û fikirê Rêbertiya xwe rojek berî rojekê bi awayek azad berê xwe bidin Bakurê Kurdistanê. Ez û keçên xwe gelek caran bi hevre stiranan dibêjin û govendê digirin. Ez di aliyê govend û stiranên Kurdewarî de wan perwerde dikim. Hestekî gelek xweşe zarok û bav bi hev re stiranan bibêjin. Ez bang li tevahî gelê Kurd dikim ku zarokên xwe li ser çanda Kurdî perwerde bikin.”

# Lêkolînerên Çînî dest bi xebatên çandina riwekan a li Marsê kirin

Navenda Nûçeyan

Lêkolînerên Çînî bi armanca ku Marsê bikin gerstêrkeke hêşîn, dest bi lêkolîna çandina riwekên bejayî kirin.

Ji Akedemiya Zanistan a Çînê ekolog Xiaoshuang û ekîba wî li ser riwekên ku wê li gorî şertên dijwar ên Marsê çêbibin, dest bi lêkolînan kirin.

Lêkolîn bi taybet li ser cureyeke kevzê ya bi navê Syntrichia Caninervis tên kirin.

Cureya kevzê ya bi navê Syntrichia Caninervis bi taybetiya xwe ya weke li cihên bilind û çolan jî çêbibe, derdikeve pêş.

Ekîba lêkolîneran li ser cureya kevzê ya navborî ceribandinên weke dehîdrasyona zêde, cemidandina demdirêj û radyasyonê yên şert û mercên Marsê sembolîze dikin, kirin.

Di encama van test û lêkolînan de hate çavdêrîkirin ku cureya kevzê



ya bi navê Syntrichia Caninervis dikare şîn bibe û di hin rewşan de jî di demeke kurt de şîn dibe. Lêkolîneran têkildarî xebata xwe ev yek anîn ziman: ‘’Her çend li pêşiya me rêyeke dirêj hebe jî ku em li gerstêrkên din qadên jiyanî yên ku xwe bi xwe pêk tên ava bikin jî ji bo ku em li Marsê dest çandina riwekan bikin me gelekî li ser riweka pêşeng a bi navê Syntrichia Caninervis kar kir.’’

Ev xebat di rêya kolonîbûna li Mars û gerstêrkên din û zêdekirina derfetên çandina riwekan de weke pêngaveke girîng tên dîtin.

Xebat dikarin ji bo çandiniya li ser rûberê gerstêrkan a di warê pêkanîna axa berhemdar û pêşketina jiyanê de têkariyeke mezin bikin. Her wiha ev yek di heman demê de tê wateya ji fezayê re hilpekandina cureyên zeftkar û lixwegirtina berpirsiyariyan jî.

Sudoku: Bersiv 2

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 9 | 8 | 3 | 4 | 5 | 1 | 7 | 2 |
| 3 | 5 | 7 | 9 | 1 | 2 | 6 | 8 | 4 |
| 2 | 4 | 1 | 7 | 8 | 6 | 3 | 9 | 5 |
| 8 | 1 | 2 | 5 | 9 | 7 | 4 | 3 | 6 |
| 5 | 7 | 4 | 6 | 3 | 1 | 9 | 2 | 8 |
| 9 | 3 | 6 | 8 | 2 | 4 | 5 | 1 | 7 |
| 1 | 6 | 5 | 2 | 7 | 3 | 8 | 4 | 9 |
| 4 | 2 | 9 | 1 | 6 | 8 | 7 | 5 | 3 |
| 7 | 8 | 3 | 4 | 5 | 9 | 2 | 6 | 1 |

Sudoku:Pirs 3

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 1 | | 7 | | | 2 | | 6 |
| 8 | | | | | | | 5 | |
| | | 2 | 6 | | | | 7 | 3 |
| | | | | | 1 | | 2 | 7 |
| | | | 8 | 7 | 6 | | | |
| 7 | 5 | | 4 | | | | | |
| 4 | 7 | | | | 8 | 5 | | |
| | 9 | | | | | | | 1 |
| 2 | | 6 | | | 7 | | 3 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Min gotina te bi şekir birî:**
- Dema yek gotina yekî dibire ji bo rêzgirtin hingê jê re dibêje.
**Pê lê nake/pê li gotina wî nake:**
- Guhê xwe didiyê; gotina wî qebûl dike; tişta ku jê dixwaze pêk tîne; rêzê jê re digire.
**Piyê min bi yê te ve:**
- Tu çi bêjî ezê weke te bikim.
**Ser çavê xwe/ser her du çavan/ser seran û ser çavan/ser bînahiya çavan:**
- Dema yek mêvanê xwe, heskiriyekî xwe pêşwazî dike, yan dema tiştek ji yekî tê xwestin hingê dibêje.
**Sê xatir nîne, xwedî xatir heye:**
- Divê mirov xatirê mirovan bizane; divê mirov tiştna bide xatirê hina.
**Stûyê min xwar e:**
- Ez li ber fermanên te amade me; tu çi bixwazî tu dikarî bi min bikî.
**Stûyê min li ber te xwar e:**
- Bi heman wateyê.
**Tu bigotin î:**
- Ji ber ku min axaftina te birî, li min bibore.
**Tu kêr û ez penîr:**
- Ez li ber destê te amade me; ka tu çawa dixwazî wisa bike!
**Tu tevir, ez kevir:**
- Bi heman wateyê.
**Tif bike seyî şerm bike ji xweyî:**
- Divê mirov xatirê mirovan bizane; divê mirov tiştna bide xatirê hina.
**Va ye serê min li ber te ye:**
- Ka tu çawa dixwazî wisa bike; ez li ber fermanên te me.
**Va ye guhê min li ber te ye:**
- Bi heman wateyê.
**Xwe jê re kir erd/xwe jê re kir erd û xwelî:**
- Pir qîmet dayê; pir rêz nîşan da.
**Xwe jê re kir erd/xwe jê re kir ax û erd:**
- Pir rêz jê re girt; pir qîmet dayê.

**LI SER KUŞTINÊ**

**Ava sere wî germ kir:**
- Biryara kuştina wî da.
**Bi devê diya xwe beicî:**
- Bi awayekî wisa hat kuştin ku ne ti kes dizane ka kê kuşt, ne ti kes hat girtin û ne ti kes lê xwedî derdikeve.
**Binax kir:**
- Kuşt.
**Binçal kir:**
- Bi heman wateyê.
**Binerd kir:**
- Bi heman wateyê.
**Çal kir:**
- Kuşt.
**Deftera wî dagirt:**
- Biryar daye ku bikuje.
**Di erdê re kir:**
- Kuşt
**Ket xwîna wî:**
- Kuşt.
**Lingên wî kirin cot:**
- Kuşt.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Jin Jiyan Azadî’ diruşmeya şoreşa jinê ya serdemê ye




Felsefeya Jin, Jiyan, Azadî veguherî bingeheke ji bo bidestxistina jiyaneke bi rûmet ji bo tevahî kesên ku daxwaza aştî û azadiyê dikin herwiha hate diyar kirin ku Jin Jiyan Azadî felsefa şikandina qeyd û bendê bindestiya jinê ye.**R-2**

## ‘DAIŞ heremên dagirkirî ji xwe re kiriye navendên xwebirêxistinkirinê’

Endamê Fermandariya Hêzên Sûriya Demokartîk (QSD) Çiya Firat diyar kir ku çeteyên DAIŞ’ê li herêmên dagirkirî bi serbestî tevgerê dikin û ew herêm ji xwe re kirine navendên perwerde û rêxistinkirinê.**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1198 | 25-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# LI DIJÎ DENGÊ RASTIYÊ Û PÊNÛSA AZAD ÊRIŞ DEWAM DIKIN

Dijminên gelê kurd li dijî dengê rastiyê û pênûsa azad êrişên xwe dewam dikin. Di encamê de, li ser rêya lêgerîna heqîqet û azadiyê gelek berdêlên giran tên dayîn. Rojnemevan û xebatkarên Ragihandina Azad di rêwîtiya xwe ya ronîkirinê û teyisandina rastiyê de, têkoşîneke bêhempa didin meşandin. Dengvedan, afrînerî û derxistina rastiyê bi hêsanî çênebûn. Tevî zext û êrişên dijmin jî berxwedaniyeke mezin tê raberkirin. Di oxira wê de jî, gelek pêşeng bi şehadeta xwe bûne meşaleyên ronîkirina civakê.**R-5**





## ‘Zagonên Terafîkî ji bo ewlehiya ajokar û welatiyan in’



Rêveberiya Terafîkê ya kantona Cizîrê, Ibrahîm Xelîl diyar kir ku zagon û cezayên ku ji erebe û ajokaran re hatine destnîşankirin ji bo ewlehiya ajokar û welatiyan in. Herwiha Xelîl da zanîn ku ew hewil didin pirsgirêkên tirafîkî çareser bikin, li aliyekî din jî pêwîste civak li gorî zagonan tevbigere.**R-6**

## Partiya Rêkeftinê; Armanc û xebat



Sekreterê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî Fewzî Şingalî anî ser ziman ku Partiya Rêkeftinê partiyeke kurdî- kurdistanî û kurdî-sûrî ye. Herwiha Şingalî diyar kir ku ew ji bo çareserkirina doza kurdî li ser bingeha lihevkirineke siyasî xebata dîblomasî didin meşandin.**R-4**

## ‘Çand û hunera me, nasnameya me ye’

Hevseroka Tev-Çand Sumeya Mihemed da zanîn ku bi armanca pêşxistin û parastina çand û hunera gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya resen, Tev-Çand xebatên xwe didomîne û got, “Em bang li hemû gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê dikin ku xwedî li çand û hunera xwe derkevin, ji ber ku çand û hunera me nasnameya me ye.”**R-7**


Ahmed Aktaş
“Qesabê Şengalê Mesûdê Berzanî”! *R-4*


Idrîs Henan
Şam Guh Bide Tirkiyê Dê Pîqinê Di Bin Xwe De Bibire! *R-5*


Hafiz Ahmet Turhalli
Aştî û misilman *R-6*

# ‘Jin Jiyan Azadî’ diruşmeya şoreşa jinê ya serdemê ye

**Felsefeya Jin, Jiyan, Azadî veguherî bingeheke ji bo bidestxistina jiyaneke bi rûmet ji bo tevahî kesên ku daxwaza aştî û azadiyê dikin herwiha hate diyar kirin ku Jin Jiyan Azadî felsefa şikandina qeyd û bendê bindestiya jinê ye.**

Jîn Hisên/ Qamişlo

Felsefeya “ Jin, Jiyan, Azadî” li tevahî cîhanê hate belavkirin ew ne tenê sê gotinên hêsanin, ew çareseriye ji bo pêvçûn û zilma bi hezarên salan li Rojhilata Navîn û cîhanê bi giştî, ji hêla Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan di çarçoveya zanista jinê ji alên 90`î ve hatiye formulekirin.

Dozên ku herê zêde bala Rêber Abdullah Ocalan dikşand di zarokatiya wî de doza jinê bû, dema ku hevala wî di temen, zarokatiyê de hate zewicandin, herwiha dema xuşka wî jî dan zilamekî li hember nextê zewacê, wekî din zordariya ku der heqê jinê dihat di hawîrdora ku tê de jiyan dikir, hişt ku bi vê dozê bifikire. Li gorî wî weke girêkeke bû ku divê were çareserkirin.

Dema Rêber Abdullah Oacalan tevlî zanîngehê bû bi siyasetê ve mijûl bû û jinê jî tevlî vê yekê kir, ku jin tevlî kongreyê damezirandinê yê partiyê bû bi pêşengtiya Sakîne Cansiz, fikre ew e ku şoreş pêk nayê bêyî tevlîbûna jinê. Bêyî rola jinê ya pêşeng di şoreşê de serkeftin pêk nayê.

Di riya têkoşîna Rêber Abdullah Ocalan ev her sê peyv bi hev du girêdayî bûn, ku mirov nikare yek bêyî ya din bikar bîne, felsefeya Rêber Abdullah Ocalan li ser van lingan xwe avakir.

Derbarê vê mijarê jinên ku cihê xwe di nava vê felsefeyê de girtine û ji bo azadiyê dixebitin ji rojnameya me re li ser giringiya vê drûşmeyê û pêşxistina wê axivîn. Endama Akademiya Jineoloji Bihar Ewrîn wiha dest bi axaftina xwe kir:” Felsefa Jin, Jiyan, Azadî xwe dispêrê çand û kevneşopîyek kûr a civakî û dîrokî ku divê ji hev neyê qut kirin. Ji ber vê ger em Jin, Jiyan, Azadî tenê weke dirûşmeyek binirxînin yê nerast be. Di rastî de Jin, Jiyan, Azadî pîvanê azadiyê ya sedsala 21`ê ye. Heya jin ji pozîsyona koletî, zayenda duyemîn û bireserbûnê dernekeve em nikarin qala jiyanek bi wate û azad bikin; ango jina azad jî tê wateya civakek azad. Çawa ku Rêber Apo jî balkişandî ser vê girîngîyê. ‘’ ez her tim dibêjim jin perçeyek jiyanê ya jêvengere. Lê divê were piştrast kirin ku ew ne tenê weke perçeyek bireser her wiha mijarek hişmendî û dîyarkere. Ji ber vê yekê çareseriya ku em pêşkêşî we dikin ne tenê ji bo we, pêwîste hemû civak azad



Buhar Ewrîn

be.’’ (Rêber Apo, Nîsana 1989) wê demê şoreşa ku li derdorê Jin Jiyan Azadî pêşdikeve şoreşek civakî û çandî ye û bi wateyek din şoreşa fikir û wîcdanî ye.”

Buhar Ewrîn wiha domand:” Jin, Jiyan, Azadî li ser bingeha bedewî, exlaq û civakîbûyîn li hemberî hişmendiya desthilatdare ku îfadeyê tunebûn û kirêtîyê ye, ji bo wê her dirûşmeyek xwedî îdeolojiyeke ku xwe dispêre wê berhemê dîrokî ye ku bi peyva îfade dibe. Jin, Jiyan, Azadî jî xwedî vê karakterê ye û bi qasî ku balkêş û diguherîne di heman demê de weke Rêbertî jî pênase kirî ‘’formûlek efsûnîy e’’ ku karaktera sereke a şoreşa Kurdistanê diyar dike û hemû deriyê ber bi azadiyê vedike. Ya girîng ew e ku bikarin şêwazê têkoşînê li hemberî sîstemê ku xwe bi awayên cûda ji nû ve ava dike, pêş bixin û li gorî pêwistiyê serdemê xwe bi fikir, bername û stratîjî gurçûpêç bikin.”

**‘Jin, Jiyan, Azadî avakirina yekîtiya jinan e’**

Buhar Ewrîn dibêje ku Jin, Jiyan, Azadî di tevegra azadiya jinên Kurd de weke dirûşma têkoşîn, berxwedan û baweriyê ye û niha bûye dirûşmeyek cîhanî ku jin li dora wê kom bûne û wiha berdewam dike:” Wê demê em dikarin bêjin yek ji taybetmendiya Jin, Jiyan, Azadî avakirina yekîtiya jinan e ku sînorên Kurdistanê derbas kirî û di rastî de bûye manîfestoya şoreşa jinan di sedsala 21`de çawa ku jin weke ‘’yekem mêtîngeh’’ hatiye pênase kirin û li sê merhela şikesta zayendî derbas bûye, Jin Jiyan Azadî jî bûye pîvanê tolgirtina ji vê zilma dîrokî û guhertina vê pêşveçûna dîrokî. Ji bo ku dîrok ji nû ve were nivîsandin divê rastiya koletiya jinê were eşkere kirin û li ser vê esasê bikarin ji bo avakirina azadiyê şer bikin, ji ber vê têkoşîna jinan li hember hişmendiya mêrê serdest bi qasî ku siyasî ye di heman demê de çandî, civakî û zîhniyetî ye.”

**‘Ji bo pêkhatina şoreşê**



Melîka Hesaf

**pêwisîtî bi paradîgmayek demokratîk heye’**

Ji bo pêkhatina şoreşê pêwîsîtî bi paradîgmayek demokratîk heye ku di vê de jin binirxîne û li ser vê esasê mirov dikare qala azadiyê bike; Buhar Ewrîn wiha domand:” Tevger û têkoşîna ku li ser bingehê felsefa Jin, Jiyan, Azadî de dimeşin bi rêka rêxistin kirinek xurt dikarin di pêşketina têkoşîna demokratîk li her beşên Kurdistan û Rojhilata Navîn bi bandor be. Jin, Jiyan, Azadî felsefa ‘’çawa bijîn’’ e û tabolya ku niha em dibînin bi pêşengiya jinan dikare jiyana azad ava bikin, ji ber vê yekê azadiya jinê weke potansîyêlek bihêz di sedsala 21`an de mijareke girînge û di nav vebijêrkên heyî de xwedî qabilîyeta ku bikare bighîje encamê. Lê divê li kêleka derfetên heyî ji bo azadiyê ji metirsiyên heyî jî haydar bin. Niha êrîşek îdeolojîk û sîyasî li ser tevgerên azadiya jinê li hemû deverê cîhanê di dewrê de ye. Ango dixwazin van tevgeran bikşînin nava sîstemê û ji navarokê vala bikin.

**‘Jin Jiyan Azadî felsefa şikandina qeyd û bendê bindestiya jinê ye’**

Buhar Ewrîn wiha anî ziman:”Têkoşîna bi felsefeya Jin, Jiyan, Azadî dikare çarenûsa gelên herêm û bi taybet jinan biguhere û divê van kêliyên ku belkî dubare nebe bi awayek rast binirxînin. Di şert û mercên şerê cîhanî yê sêyemîn ku her roj berfirehtir û kûrtir dibe têkoşîna bi dirûşma Jin, Jiyan, Azadî dikare bibe mizgîniya demokratîk kirina Rojhilata Navîn. Ji ber bê hebûna jinan û giringiya wan weke hêmanê sereke yê demokrasiyê, şoreşek demokratîk pêk nayê. Ji bo wê yekê Jin, Jiyan, Azadî’’ felsefa şikandina qeyd û bendê bindestîya jinê ye.

**Hevgirtina jinan dikare bibe navenda têkoşîna hevbeş ê jinan**

Di dawî de Buhar Ewrîn bal kişand ser rola Jineolojî di nava van şoreşan de û wiha anî ser ziman:”Rola jineolojî di van şoreşan de pêşxistina civaknasiya azadiya şoreşên sedsala 21`an û hemû lêkolîn û xebatê wê ji bo avakirina sîstemek alternatîf e. Ev pergala alternatîf li ser esasê siyaseta demokratîk, aboriya komînal, civakbûn, hevgirtin û nirxên etîk û estetîk e. Bi berxwedan û têkoşîna azadiya jinê ya li hemû cîhanê derketiye holê ku tenê bi hîn zagon û reformên di nava sîstemê de ne pêkane ku encamên tê xwestin werin bidestxistin. Ji ber ku pergala baviksalarî û şaristanîya dewletparêz mayîndebûna xwe dispêre rewşa jinê ya heyî. Di van kêliyên dîrokî de hevgirtina jinan dikare bibe navenda têkoşîna hevbeş ê jinan li dijî zilma dîrokî û sîstematîk li ser jinê. Îsrar û biryar ji bo azadî dikare gelek guhertina




ava bike.

Li aliyekî din rêveberiya Weqfa Jinê li bajarê Qamişlo Melîka Hesaf jî da zanîn ku Felsefeya Jin, Jiyan, Azadî veguherî bingeheke ji bo bidestxistina jiyaneke bi rûmet ji bo tevahî kesên ku daxwaza aştî û azadiyê dikin û wiha berdewam kir:” Jin bingeha civak û malbatê ye, jin ji destpêka mirovahiyê de herdem di nava tevgerê de bû ji bo mafê xwe biparêze, her tişt di destê jinê de bû wekhevî û edalet jî serdest bû. Bi derketina desthilatdariyê û pergala baviksalarî mafê jinê hate winda kirin û jin kirin amûrek tenê ji bo karên malê û anîna zarokan û hwd.. û li ser vê zihniyetê jiyan hate berdewam kirin. Êdî jinê nema pirsa mafê xwe kir yanî fikra wê hate sînordar kirin di hin tiştan de.

**‘Bi felsefeya Jin, Jiyan, Azadî xebat hate meşandin’**

Melîka Hesaf wiha pê de çû:” Îro bi sayafikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ya Jin, Jiyan, Azadî ku gelek rol da jinê di civakê de, êdî jinê mafê xwe ji nû ve nas kir û ji bo wê berxwedan û tekoşîneke mezin hat meşandin. Û di şoreşa Rojava de jinên kurd bi taybet li ser riya felsefeya Jin, Jiyan, Azadî xebitîn û xwe îsbat kirin ku ew jî karin di tevahî warên jiyanê xebatan bidin meşandin çi di warê leşkerî, siyasî, rêveberî de û hwd..”

**‘Jin li dora raman û felsefeya Rêber Apo kom bûn’**

Melîka Hesaf wiha domand: “Jinan li dora fikir û ramanê Rêber Apo kom bûn û cihê xwe girtin û pêşketin di kesayet û ramanê xwe de çêkir, xwe bi hêz kir êdî kes nikare mafên wê jê bigre, berpirsiyartî û erkên dikeve ser milê wê bi cih tîne, bi vîn û îradeyeke xurt jinê di nava vê şoreşê de xwe îsbat kir û jinên pêkhateyên din tevlî xwe kir û felsefeya Rêber Apo ji wan re dan nasîn di heman demê de ji tevhaî cîhanê re jî. Îro bi hezarên jinan li seranserî cîhanê hemleyan li dar dixin ji bo azadiya rêber Abdullah Ocalan, ev tê wateya ku bi vê felsefeya ku derxistiye pêş bawerin û hewil didin pêş bixin û li cîhanê tevahî bê belav kirin.”

Di dawî de Melîlka Hesaf wiha anî ziman:” Bi saya felsefeya Jin, Jiyan, Azadî jinê zêdetir xwe nas kir û gavên mezin avêt, destkeftiyên xwe diparêze. Gelek navendên jinan di nava şoreşa Rojava de hate avakirin. Herwiha li hember çeteyên DAIŞ li çeperên şer sekinîn mil bi mil bi hevalên mêr re. Jinê kedeke pir mezin da ji bo felsefeya Jin, Jiyan, Azadî pêşbixe û li cîhanê belav bike. Em ji bîr nekin jî şoreşên bi navê jinan hatin li dar xistin weke ku em dibînin li rojhilatê Kurdisanê û Îranê pêk tê şoreşa bi navê Jin, Jiyan, Azadî û heta niha berdewam e li tehavî heremê.”



# Bîranînek ji Zagrosan

Leyla Weşûkanî

Di van kêliyan de çiyayê Zagrosa bilind û bedewe , hate bîra min û ez van hastên xwe yên bêrî kirinê, wiha bi lênûsa xwe re pareve dikim û di bêjim: Çiyayê pîroz û bi nav û deng xweza ku ez, niha di nava rêze zinarên tede wek xezalekê bi bezyama û min çirvîtik vedaba. Xweska ew rojên berê vegeryaban û ez li ser serê, Govendê û Çarçêla bi bezyama û paşî çûbama, Gerdiya û girê Ronahî û min ji hevalan re qala wan rojên berê kiriba. Ey Zagros ez xwe hazir dikim ku, careke din vegerim ware te yê şêrîn lê qet ez nikarim, wan hevalên wê demê vegerînim û ev jî, ciyê xembariya min e. Em gerîla bi bîranînên şehîdan û rojên, zor û zehmet re jiyan dikin û heger ku ew nebana, teqez em ê jî nebana: Ew rojên dîrokî me li ser piyan digirin û hêz didin me.

Di van kêliyên ku ez vê nivîsê di nivisînim de, bîranînek ji salên berê hate bîra min û ez ê parve- bikim: Ev bîranîna min di sala 1997 an de li Zagrosê û bi taybet jî, li derûdora qada Avaşînê çêbûye û bandora xwe, ya hestiyarî gelekî li ser min hêlaye û ev bîranîna min jî li, ser hevalên gerîla yên, gaziye û ez di xwazim qala wê pêvajoyê bikim. Di sala 1997 an de rêxistinê piroja qada 7 destpêkir û ev piroje, jî li ser bingeha ku gerîla hemû kar û xebatên xwe, yên çandiniyê û berhem girtinê bi hêza xwe ya, zatî pêkbîne û wek têye zanîn PDK ê gelekî ji gerîla re, tengasî û engel çêdikirin û bi van sedeman, xelkê Başûr nikarîn karekî ji gerîlan re bikin. Bi taybet jî di salên 1996 an û 1997 an de û dema ku pêşmergên xiyanetkar di zanîn, ku kesek bi mere xebat dike yan wî di kuştin yan jî di revandin.

Li ser van bingehan gelek sazî hatin çêkirin û ji bo parastina van saziyan, jî saziyên parastinê hatin amade kirin; wê sê komên hevalan li ser sê giran hatibana bi, cih kirin û li her girekî jî wê doçkayek hatiba bi cih kirin. Piraniya saziyan li derûdora qada Çemço di man û wê demê, jî çamço girêdayî Zagrosê bû; ji xwe çemço niha giurêdayî herêma Zapê ye. Gelek saziyên vê qadê hatin çêkirin û gelek, hevalên jin jî di qadê de ciyê xwe girtin: Ji ber hejmara hevalan di qadê de zêde, bû teqez gerek bû ku parastina qadê jî bi hêz be û li ser wê bingehê sê komên hevalan, li sê girên sitiratîjîk de hatin bi cih kirin. Li wan sê giran de jî sê doşka hatin bi cih kirin û hevalên, rewşa wan a fîzîkî guncav li wan giran hatin bi cih kirin.

Hevalên ku wê li wan giran bi cih bibana wê, du komên hevalên jin bana û komek jî wê hevalên xort bana; hevala Tekoşîn Dêrika Hemko li ser girekî fermandar bû: Hevala Tekoşîn beriya niha carekê şehîd, hatibû îlankirin û di heman operesyonê de jî, şehîd dikeve. Hevala Tekoşîn wê operesyonê tevahî beşdar bû, heyanî demsala payîzê û piştî bi dawî kirina operesyona dewleta Tirk, tevî hevalan derbasî herêma Xakurkê dibe û di kenarê rêze zincîra zinarên Şekîf de, di nava berfê de şehîd dikeve. Şehadeta hevala Tekoşîn gelekî giran bû, pir zehmete şehadetek wiha:

Li ser girê duyemîn jî hevalek ji Dêrsimê di sekinî, lê ez niha ji heval xeberdar nînim û girê siyemîn jî yê hevalên Xort şehîd Sîpan Efrîn di sekinî. Hevalê Sîpan jî kevin bû gelekî jî şareza û ji xwe, bawer bû. Hevalê Sîpan jî di sala 1999 an de, di çalakiya li ser bajarokê Başûrê Kurdistanê Çomanê de, şehîd ket di encama ku gûlê ji lingê xwe, de di xwe û heval pêre nagihêjin û xwînê wenda dike û şehîd dikeve. Ev şehadet jî ciyê xembariyek pir mezine û hevalên di çalakiyê de jî hemû xembar bûn li ser, wendakirina heval û ji rêxistinê re, xisarek pir mezin bû. Ez jî wê demê li ser doşka girê karker, dimam û em 8 heval bûn.

Dewleta Tirk a faşîst di serê biharê de li herêma, Zapê dest bi operesyonê kir û gav bi gav pêşde dihat û di demsala payîzî de, berê xwe da herêma Zagrosê. Ji xwe operesyon pir berfireh çêbûbû, KDP jî beşdarî operesyonê bibû, di heman demê de çete û sîxur jî tevî bi hezaran leşkerên, dagirker beşdarî vê, operasyonê bûn û operesyonê mehekê zêdetir jî dirêjkir. Di wê operesyonê de ku pir berfireh bû, di hevalan de jî gelek westandin çêkir û pir birîndar û şehîd jî çêbûn. Tevî berxwedana bê hempa jî lê hêza dijmin bi sed qatan ji ya me zêdetir bû, ji xwe cebilxana me jî di heremên denetima dijmin, de ma û gelek ji me jî mecbûr man ku xwe di nava dijmin de, veşêrin ji bo bi saxî nekevin destê dijmin; tenê di destê mede narincoka destan hebû( Bomba dest) ji bo ku dijmin bi me bihise, meyê bi xwe û wan de teqandiba.

Li kaniya ga hejmara me hate zêde kirin û em bûn du kom komek em hevalên jin bûn û komek jî hevalên xort bûn, ji xwe piştê demekê hevlên rêveberiyê gazî me, kirin û gotin ku hunê alîkariya gaziyan bikin û ji wan re, hin azûqan kombikin ji xwe her roj em li erkan bûn. Ji xwe her ku dem dirêj dibû di hevalan de, westandin dihate çêkirin û dijmin



jî hêza xwe, zêdetir dikir. Tişta ku gerek me pêkanîba jî tenê bi dizî xwe gihandiba, ser serê çiyayê Çarçêla lê mixabin ew jî pir zor û xeternak bû, naxwe tenê yek riya me dima û ew, jî xwe di nava dijmin de bi hunerek mezin, veşartin bû. Piştî ku em ji cem hevalên gazî bi rê ketin, em derbasî qada Herkî bûn û hejmara me 41 heval bû, ji xwe koma me ya mezin jî hemû hevalên jin bûn.

Bi sedema ku me qad nasne dikir 2 hevalên xort, wek rêzan bi koma hevalên jin re tevger dikirin, lê mixabin belafirên şer yên Tirkan li me dan û 7 heval şehîd ketin û 4 heval jî birîndar bûn, me hevalên şehîd veşartin û birîndar jî, li ciyek guncav veşartin û 2 hevalên doctor bi wan re, man ku yek ji wan jî hevala Evîn Tirk bû ku piştî wê operesyonê bi salekê şehîd dikeve. Di wê operesyonê de jî dijmin qet xwe, berneda nava newalan de û ji tirsan re her li ser serê giran, xwe bi cih kiribûn lê sed heyf û mixabin, xayînên bê şeref û namûs mirovên ketî wek pêşmergên Berzanî, kuçikên ber deriyê dijminan li şûna dijmin xwe berdan newal û deştan de. Pêşmergên Berzanî yên der exlaqê mirovî xwe, ji xizmeta dijmin re berdan her cih û newalê de. Xiyanetkaran xwe berdan kenarên çemê Avaşînê û ciyê hevalên birîndar û gazî dîtin û heval şehîd kirin.

Bi rengekî hovane şeval şehîd xistin û heyanî hinek hevalên gazî xwestin ku xwe bavêjin çemê Avaşînê; jî pêşmerge wan digirin û di avê de, wan di fetisînin. Bi rastî hovitiyek wiha li tu devera cîhanê çênebûye û ez bawerim wê çênebe jî, lê li cem KDP ê hate çêkirin û ev jî bê exlaqiya herî mezine di derheqê, mirovahiyê de. Ji ber ku hevalên gazî wek çend beşan xwe bi, cih kiribûn hinek heval ji destê pêşmergan xelas bûn, ji xwe 4 hevalan jî xwe kom kiribûn û dema pêşmereg êrîşî ser wan dikin ew bomba xwe, bi xwe de teqînin û wiha şehîd di kevin. Ew qebheta ku pêşmergan bi serê hevalên gazî de kirin rûyê mirovan ji ber sor dibe, lê mixabin Berzanî û eşîra xwe fêrî xiyanetê bûne û ji bo, wan bûyerek pir xwezayî ye û heq kirine ku mirov ji wan re, her çi bibêje di nerîna min de ku ji dijmin zêdetir, ew bi mere dijminatiyê dikin û gerek em tolê ji wan bigirin.

# ‘Çand û hunera me, nasnameya me ye’

Birûc Resûl/Qamişlo

**Hevseroka Tev-Çand Sumeya Mihemed da zanîn ku bi armanca pêşxistin û parastina çand û hunera gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya resen, Tev-Çand xebatên xwe didomîne û got, “Em bang li hemû gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê dikin ku xwedî li çand û hunera xwe derkevin, ji ber ku çand û hunera me nasnemeya me ye.”**

Tevgera Çand û Hunera Netewa Demokratîk a Mezopotamiya(TEV-ÇAND) yek ji tevger û bizaveke hunerî û çandî ye ku di sala 2006’an li Rojava hatiye damezrandin û gelek kar û xebatên hêja daye meşandin. Derbarê piroje, kar û xebatên Tev-Çand de, hevseroka Tev-Çand a Bakur û Rojhilatê Suriyê Sumeya Mihemed ji Rojnemeya me re axivî.

**Girêdana gel bi çand û huner e xwe ve**



Sumeya Mihemed balkişand ser kar û xebatên Tev-Çand yê Bakur û Rojhilatê Suriyê û wiha got: “Piştî Konferansa Tev-Çand ya 2024`an, biryarên ku hatin girtin ew bûn ku salelek jê li ser asta Bakur û Rojhilatê Suriyê festîval werin li dar xistin, her wiha salek jê jî wê li ser asta kantonan nwere li darxistin wek festîvalên çano, muzîk, govend, sînema, wêje û hwd…, di heman demê de wê perwerdeyên rêxistinî werin dayin, ji ber ku me xwest girîngiyê bidin aliyê berwerdê. Heya niha kar û xebatên Tev-Çand li ser asta Bakur û Rojhilatê Suriyê bi awayekî baş û aktîf derbas dibe, li gorî rewşa ku li herêmê derbas dibe ji aliyê êriş û şerê taybet ve, lê em dikarin bêjin ku gel bi çand û hunera xwe ve heya astekî bilid ve hatiya girêdan û her ku diçe di milê pirojeye û çalakiyên çandî û hunerî berfer dibe.”

**Piroje**

Sumeya di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Me wekî Tev-Çand 3`ê dewreyên girtî li ser asta Bakur û Rojhilatê Suriyê bi zimanî kurdî da destpêkirin, piştî wê jî perwerdeyên fikirî û piratîkî li hunergihê hat dayin ew jî nêzî 3`ê mihan dewam kir. Niha jî pirojeyên ku em li ser dixebitin, ew jî pirojeyê me yên hunergihê ne, ev stranên herî dawî ku tême çêkirin bi taybet ya bi nave Hîcaz hat amedakirin ku tê de 72 endam cihê xwe lê girtin û piştî demekî kurt wê were weşandin. Her wiha pirojeya komîna sînema wê dest bi fîlmekî nû bikin, ew fîlîm bi navê ‘Kekê Min’ li serb rewşa ku gelê Êzîdî li derbas bûn û di heman demê êrişên ku li ser herêmê har kirin, zehmetî û êşa gel derdixe. Hazirtiya fîlima bi nave ‘Kekê Min’ wê nêzî 3`ê mihan dirêj bike heya ku were amadekirin û weşandin. Di heman wextî de pişbirkek sînariyo yên şano li asta Bakur û Rojhilkatê Suriyê hat li darxistin, armanca me ji vê pişbirkê ew bû ku nivîsa sînariyo ji hindirê herêmê bin, ji ber ku dema ku me şano li dardixst her4 sînaryo ji derva dihat gitin, li ser vê bingihê me xwest asta nivîsandina sînaryo li herêma bilind bibe. Niha jî em hazirtiya akadimîyek hunerî dikin, wekî zaningeh be. Her wiha wê beşê sînema, şano û muzîk, armanca me ew e ku mamoste em derbixin û pêwîstiyê me ji mamosteyên derve tune be.”

**Çalakî**

Sumeya mihemed da zanîn ku çalakiyên ji bo pêngava Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo berdewame û wiha got: “Çalakiyên Tev-Çand berdewamin, bi taybet ji bo pêngava Azadiya Rêber Apo ya fîzîkî, nêzî 6 konser li sar asta cizîrê hat li darxistin û em ê li ser asta Bakur û Rojhilatê Suriyê jî konsaran li darbixin ji bo piştgirya Rêber Apo. Her wiha daxuyanî jî hatin dayin.”

**‘Çand û huner eynika civakê ye’**

Hevseroka Tev-Çand a Bakur û Rojhilatê Suriyê Sumeya Mihemed di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Çand û huner eynika civakê ye, pêwîste em bi gevên mezin û aktîf tevbigerin. Di herî dawî bangewaziya me ji bo her çar parçeyên Kurdistanê heya ku xwedî li çand û hunera xwe derkevin, ji ber ku çand û hunera me nasnemeya me ye.”

# ‘Zagonên Terafîkî ji bo ewlehiya ajokar û welatiyan in’

Rêveberiya Terafîkê ya kantona Cizîrê, Ibrahîm Xelîl diyar kir ku zagon û cezayên ku ji erebe û ajokaran re hatine destnîşankirin ji bo ewlehiya ajokar û welatiyan in. Herwiha Xelîl da zanîn ku ew hewil didin pirsgirêkên tirafîkî çareser bikin, li aliyekî din jî pêwîste civak li gorî zagonan tevbigere.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**





Rûdanên terafîkî û nirxên cezayên ku li erebe û ajokaran tê birîn, li aliyekî din jî bikaranîna erebeyan ji hêla zarokan ve, herwiha hin mijarên din dibin sedema derxistina qezayên terafîkî. Têkildarî heman mijaran rêveberiya Terafîkê ya Kantona Cizîrê, Ibrahîm Xelîl bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Sedem çi ye ku nirxê cezayên li ajokar, erebe û motoran tê birîn bilind e û hejamara cezayan gelek e?**

Wekî em dizanin berî niha nirxê ceyzayên ku li ser ajokar û erebeyan dihat birîn pir hindik bûn. Ev yek dihişt ku ajokar piraniya zagonên trafîkî bin pê bike, tevî ku hewldanên me ji bo pêşîgirtina vê yekê hebû, lê belê dihat domandin. Em neçar bûn ku êdî nirxê cezayan bilind bikin. Dema ku nirxê cezayan kêm bûn, gelek ajokar derveyî zagonên terafîkê tevdigeriyan, eger cezayek lê bihata birîn, bandor lê nedikir. Ajokar zagon bin pê dikir û rasterast cezayê ku lê hatibû pêkanîn, dida. Cezayên ku em pêk tînin tu cudahiyê naxe navbera tu kesan de, ne kesên zengîn û ne yên din. Dibe ku cezayên bilind ne di xizmeta hin kesên belengaz de be, lê belê ev zagon û biryar ji bo selametiya wan ji rûdanên terafîkî ye. Dema ku nirxê cezayan bilind bû êdî ajokar neçar man ku li gorî sîstem, zagon û biryaran tevbigerin. Zagonên terafîkî jî tev ji bo rêkûpêkiya tevgera erebe û welatiyan e. Lewma pêwîste welatî û hemû ajokar li gorî zagonên terafîkê bimeşin.

**-Di dema heyî de îşaretên terafîkî ye di çi rewşê de ne, gelo çima hertim ji xizmetê derdikevin û kengî wê ev mijar bê çareserkirin?**

Destpêka ku me nîşaneyên terafîkî li tevahiya bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih kirin, gelek pirsgirêkên tirafîkî hatin çareserkirin. Di encamê de jî rêjeya rûdanên terafîkê pir kêm bûn. Sedem ew bû ku ajokar bi sîstematîk tevdigeriyan, rast e di destpêkê de ajokar ne li gorî nîşaneyan diketin tevgerê, lê bi demê re ev pirsgirêk hate çareserkirin. Îşaretên rengîn yên terafîkê ji bo rêkûpêkdariya tevgera ajokar û mirovan xwedî girîngiyeke pir mezin e. Piştî ku îşaret ketin xizmetê de bi demeke kurt, êdî hin pirsgirêkên teknîkî derketin pêşiya îşaretan. Ev yek dihişt ku şaşîtiyan çêke di warê tevgera terafîkî de. Lewma me pêwîstî didît ku werin rawestandin. Ev bûye nêzî salekê, ji ber sedema pirsgirêkên teknîkî, îşaretên terafîkî hatine rawestanin. Ji ber tunebûna parçeyên teknîkî îşaretên, ew ji xizmetê hatine derxistin. Lê em tekez dikin ku hewldanên me ji bo peydakirina parçeyan hene û wê di rojên pêş de ev pirsgirinêk çareser bibe.

**-Hûn xeteriya ajotina zarokan ji erebe û matoran re çawa dinerxînin û zagonên di vê derbarê de çiqasî dikevin piratîkiyetê de?**

Wekî tê zanîn li gorî zagonên terafîkî, qedexe ye ku temenê ajokar di bin 18’an re be. Yek ji sedemên pirbûna diyardeya rûdanên terafîkî, ajokarên ku temenê wan di bin 18’an de ye û erbeyan diajonin. Di encamê de rûdan çêdibin, zererên canî û madî çêdibin, gelek caran ew kes jî jiyana xwe ji dest didin, hem zererê dighînin xwe û hem jî didin derdora xwe. Ji ber vê yekê jî me hin biryarên tund di derheqê ajokarên temen biçûk de, da. Yek ji van biryaran ew e ku dema em pêrgî ajokarên biçûk tên, eger erbe an jî mator pêre be, tê girtin. Herwiha jî belgeyekê ji kesên nêzîk yên ajokarên biçûk, eger bav anîj bira û hwd… be tê xwestin. Ev yek jî ji bo were tekezkirin ku careke din ev kesê zarok erebeyan neajone. Pêngava li dijî ajotina kesên bi temen biçûk tê domandin û em hewl didin ku vê diyardeya xeternak ji nav civakê rakin.

**-Gelek rûdanên terafîkî li herêmê çêdibin, gelo sedem çi ye? têkildarî vê pirsgirêkê çi biryar û riyên çareseriyê hatin destnîşankirin?**

Pir sedem hene ku dihêle diyardeya rûdanên terafîkî zêde bibin, hejmara mezin a rûdanên trafîkê yek jê, ji ber nepabendbûna ajokaran bi biryarên destnîşankirî û nîşanên trafîkê ye. Yan jî gelek ajokar gelekî bi lez diajon û leza destnîşankirî ji erbeyan re derbas dikin. Herwiha diyardeyeke din a xeternak heye ku ew jî hin ajokar di bin bandora madeyên hişbir erebeyan dajonin. Li aliyekî din jî kesên bi temen biçûk erebeyan diajon, hem jî di warê teknîkî de hin pirsgirêk di erebeyan de çêdibin û ajokar lênerîneke giştî ji erebeyan re çênakin. Di heman demê de hin ajokar bê ku qoçana ajotinê derxînin, tevdigerin. Di encama hemû sedemên ku me anîn ser ziman, rûdanên zor û gelek dijwar çêdibin. Da ku hejmara rûdanan kêm bibe û civak bi rêkûpêk bimeşe, dewriyeyên trafîkê, radar û broşurên hişyariyê li têne zêdekirin û hejmarek kêm ji ajokaran, pabendî van rênimayan in. Bi vî rengî pirsgirêka kirîza trafîkê û diyardeya rûdanên pir, çareser dibin.

**-Heta ku welatiyek bikaribe qoçana ajotinê bi dest bixe, pêwîste çi bike, di heman demê de mercên derxistina qoçanan çi ne?**

Heta ku welatiyek qoçana ajotinê bi dest bixe pêwîste di hin ezmûnan re derbas bibe û hin mercan bi cih bîne. Di serî de divê temenê ajokar di ser temenê qanûnî re be û temenê guncaw ji 18’an û bi şûn de ye. Herwiha xwedî dîtin û çavên baş be li gorî vê yekê jî perwerdeya îşaretên ajotinê û fêrkirina ajotinê tê çêkirin. Di heman demê de jî divê perwerdeya mîkanîkî jî ji bo ajokar tê dayîn û hem jî qanûnên trafîkê ji bo wî/ê tên nasandin. Piştre jî derbasî ezmûna ajotinê û ya mîkanîkî dibe, wekî din jî ezmûna îşaret, tabloyên ku li deveran tê bicihkirin û zagonên terafîkê tê çêkirin. Pêvajoya derxistina qoçanê ya ku ajokar tê re derbas dibe, di bin çavdêriya komîteyek trafîkê ya pispor de tê çêkirin. Di encamê de jî eger ajokar zagon û ezmûnên cihêreng derbas kirin, qoçana xwe werdigire.



## Aştî û misilman

Hafiz Ahmet Turhalli

Roja yeke Îlonê roja cîhanê ya aştiyê ye. Ji bo cîhan karibe di nava aşitiyekê de bijî, ev roj weke roja cîhanê ya aşîtiyê hatiye binavkirin. Di yekê Îlona 1939’an de, şerê cîhanê yê duyemîn destpêkiriye. Divê şerî de zêdetirî şêst milyon mirovî jiyana xwe ji dest daye. Qaşo bi mûnasebeta vê rojê, roja aştî ya cîhanê hatiye ragîhandin.
Di serdema me ya îro de mixabin aştiyekî di nava cîhana mirovahiyê de xuya nake û her diçe şurên seqandî zêdetir tên kişandin.
Li gellekê deverên dinyayê şer berdewame û her diçe ev şerane zêdetir dibin.
Weke mînakên rojane: Rûs û Ukranya, Îsraîl û Filistîn, Kurdîstan ji xwe her tim dinava agir de maye û şer jê kêm nebuye, her diçe neyarên aşitiyê vê şerî dijî milletê me yê Kurd, kurtir û berfirehtir dikin.
Li başur, Bakur, Rojava û Rojhelatê Welatê mede, her kêliyekî xwîn tê rêtin. Mixabin şerê hevdu tunnekirinê, herî zedê dinava me bawermendên ola Îslamî de pêş dikeve.
Ji Nîjeryayê heta Afganîstanê şer, pevçun û malwêranî berdewame.
Dewletên rojava Emerîka ê Awropa, ji bo berdewamiya berjewendiyên xwe, şerên heyî gurtir dikin, daku karibin zêdetir qezencên maddî bidest bixin.
Cîhana Îslamî de bi sedan salane şer û pevçun bê navber berdewamin. Carna navxweyi û carnajî bi der û dora xwere, dinava şerdane. Şer, kuştin û malwêranî di cihana meya Îslamîde, buye weke çandekî olî û aşitîjî weke qelsîyekî di jiyanêde tê dîtin.
Xwedayê mezin di Qur’ana pîroz de bangî bawermendên Îslamê dike ji bo aşitî û aramiyê. “Gelî bawermendan; Tev bihevre bikevin nava aşitiyê! Li pêy gavên şeytan neçin: lewre ew dijminê we yê eşkere û naskirî ye.” (Beqere 208)
Ligor vê ayeta han kesê/kesa pey şer biçe, doza aşitî û dadmendiyê neke, lipey gavên şeytan dimeşe. Kesên li pey şeytan bimeşin nikarin bejin em lipey doza Îslamê dimeşin.
“Tenê kesê sedeqe dide, başî qencî dike û navbera mirovan de aşîtiyê pêk tîne. Jê re ecrekî mezin heye.” (Nîsa 114)
“Xweda gazî we dike jibo welatê aşitiyê”. (Yûnis 25)
Li gor banga Xwedê divê hemû bawermedên Ola îslamê, ji bo aşitîyê kar û xebat bikin.
Ne ji bo kuştin, malwêranî u destdanîna ser erdû malê xelkê şer bikin.
Ev hişmendiya neha dinava me misilmanandeye ne hişmendî û baweriya Îslamêye, ev hişmendiya desthelatdarên nava meye. Divê zutirîn dem, em xwe jivê hişmendiya çewt rizgar bikin.
Li gor Îslamê şer û pevçun nebaşin; divê hergav rê û rêbazên aşitî û diyalogê bingeh werin girtin. Lewre şer têkşikandina hemu tiştane. Civak, aborî, zanebun, xweza, malbat û nirx hemu tên tunnekirin. Heqîqet û rastî tê kuştin: derew, fesadî, fîtne û xapandin zêde dibin.
Mejiyê me bawermendan ewqas hatiye dagirkirin ku, wate û naveroka ola me, jibinîve hatiye berovajî kirin. Îslam tê wateya teslîmbuna heqîqeta Xwedê û jiyanekî aştîxwaz.
Lê mixabin piştî koça Pêxemberê me Hz. Muhemmed sXl li ser, ev ol; bû amurê destê bendeyên desthelatdaran. Ev ola ku naveroka wî hatiye valakirin, bu amurê belavkirina şer û dagirkirina xaka milletan. “Kê bihustekî erdê yekê bi zorê dest deyne ser, heft qat zêdetirê wê erdê, ewê bi hustiyê wîve vere daliqandin.” (Buxarî, Mezalîm 13; Muslîm, Musaqat,139-142)
Bi hêviya aşitiyekî mayinde, roja weya aşitiya cîhanê pîrozbe.



# ‘DAIŞ heremên dagirkirî ji xwe re kiriye navendên xwebirêxistinkirinê’

Endamê Fermandariya Hêzên Sûriya Demokartîk (QSD) Çiya Firat diyar kir ku çeteyên DAIŞ’ê li herêmên dagirkirî bi serbest tevgerê dikin û ew herêm ji xwe re kirine navendên perwrde û rêxistinkirinê.

**Amara Baran/ Qamişlo**



Çeteyên DAIŞ’ê li ser destê QSD’ê li Baxozê têk çûn û cografiya ku li ser serwerî dimenşand, ji destê wan hat rizgarkirin. Endamên DAIŞ’ê ku reviyan, li ser hişmendiya DAIŞ’ê bi awayekî veşartî karê xwe yên tûndrew dewam kirin. Sedemên ku di destpêkê de çeteyên DAIŞ’ê pir zû pêş ket, artêşa Sûriyê û Iraqê bû. Ji ber ku herdû artêşan ji ber DAIŞ’ê reviyan û li ber xwe nedan. Hinek dewletan jî xeteriya DAIŞ’ê cidî negirtin. Hinek hêzan jî, çavê xwe ji wan girtin û xwestin wan ji bo xwe bikar bînin. DAIŞ ji van welat û nêzîkatiyan sûd wergirt û bi lez pêşket. Neha jî çeteyên DAIŞ’ê bi israr in ku kiryarên xwe yên terorî dewam bikin.
Çeteyan di demeke kin de ewqas imkan bi dest xistin û bi deh hezaran çete ji welatên derve kom kirin. Piranî jî bi navê cîhad û xîlafeta islamî rêxistin kirin û derbasî heremê kirin. Li aliyê din jî hemû nirxên mirovahiyê binpê kirin. Dixwaze mirovahiyê vegerîna sedsala heftan û tevahiya ol, bawerî û çandan perçe bike. Şidest û zordestî ji xwe re kir bingeh û li ser wê bingehê tevger kir.

### DAIŞ li hemberê mirovahiyê tevahiya kiryarên dijmirovî pêk tîne

DAIŞ niha mirovan dike kole, jinan ji xwe re wekî genîmeta şer dibîne, li hemberî mirovahiyê ti xirabî û şidet nemaye ku pêk nanîye. Ji bo wê pewîste hemû welat li hemberî DAIŞ’ê tevbigerin û nehêlin ku ew ji van derfet û îmkanan sûdê werbigre û li ser tevahiya mirovahiyê xeteriyê ava bike.
Dewleteke wekî Tirkiyê û serokê wê Erdogan jî hişmendiya wan pir ne cuda ye. Ew nîşan dide ku xeta wê ya bingehîn olî ye, lê di rastiyê de nijatperstiya Tirk pir li pêşe û xwedî hişmendiyeke reş e. Ew piştgiriyê dide hemû kiryar û komkujiyan û wan rast dibîne. Heman komkujî û pişaftinên ku li ser kurdan dimeşîne. Ew ji çeteyên DAIŞ’ê zêdetir li ser kurdan komkujiyan pêk tînin û dixwazin cografiya xwe firehtir bike. Dagirkeriya Tirk li Sûriyê ji DAIŞ’ê re herêm vekir û çete jî ji vê yekê sûdê werdigrin.
Dagirkeriya Tirk bi giranî êrişên xwe li ser herêma Rêveberiya Xweser dike, dixwaze Rêveberiya Xweser hilweşîne û ji bo vê yekê tevahiya kiryaran pêk tîne. Ya ku herî zêde ji van êrişan sûd digre jî DAIŞ’ê ye û tevgera wê zêde dibe.
Ji xwe dijminê gelan yê sereke dewleta Tirk a dagirker e, ew bê sînor dijminatiya Îradeya gel dike. Ew endama NATO’yê ye û imkanên wê pir in, her wiha di qada navneteweyî de jî piştgiriyê ji Erwopa, Emrîka û NATO’yê werdigre. Li aliyê din jî têkiliyên wê bi welatên derdorê re heye. Ji bo wê bi rengekî hesanî tevahiya pîvanên mirovahiyê binpê dike.
Di aliyê hişmendiyê de jî dewleta Tirk û DAIŞ pir nêzî hevin û tu cudahî di navbera wan de tune ye. Piştî ku dewleta Tirk herêmên Sûriyê dagir kir, çeteyên DAIŞ’ê pir bi rehetî di van herêman de tevgerê dikin, aboriya xwe pêş dixe û têkiliyên xwe dimeşîne. Li herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyê de, DAIŞ endamên xwe rêxistin dike û ji wir derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya herêmê dibe.

### Li Rojhilata navîn şer her diçe berfireh dibe

Li giştî cîhanê şerekî sêyemîn tê jiyan kirin, navenda wê jî Rojhilata Navîn e. Her diçe germ, fireh û kûr dibe. Di Rojhilata Navîn de Iraq û yek Sûriyê hatin asta hilweşandinê, Îraq di aliyê siyasî de perçe perçe bûye û biryara wê ne di destê wê de ye. Hikumeta Şamê jî pir lawaz bûye, hikumetê Şamê hatiye wê astê ku nikare eskerê xwe biparêze. Ji ber wê çeteyên DAIŞ’ê li ku derfetê dibîne êriş dike, valatî li ku hebe, çete xwe li wir bi cih dikin. Van her du dewletan xeteriya DAIŞ’ê dizanîn, operasyonên wan li dijî DAIŞ’ê dewam dikin, lê ew di aliyê istixbarat û ewlekariyê de lawaz bûne û serweriya wan li holê nîne. Ji xwe civak jî destekê nade wan, ji ber ku wan sîstemekî demokratîk ava nekirine û di herêmên wan de valatî heye. Li aliyê din ve jî şerê Israyîl û Hemasê mezin bû û Îran ketîye nava vî şerî. Dewleta Tirk jî li Sûriyê û Iraqê şer daye meşandin û rojane êriş dike. Linge Tirkiyê li aliyekî bi NATO, Emrîka û Ewropa re ye û lingê wê yê din jî bi çeteyên DAIŞ‘ê re ye. Tirkiyê bi hezaran çete li derdora xwe kom kiriye.
Li Iraqê artêşa navendî zêdetir koma Heşid Alşehbî heye, milîs hene Sûriye jî weke vana ye. Ji bo wê qasê ku pênase dikin qasê xeteriya DAIŞ’ê dibînin nikarin bi hevre kordîne bikin enerjiya xwe istixbarata xwe bixin hereketê. Pêwîste derfet neyê dayîn ku DAIŞ xwe birêxistin bike, nefes bigre û çavkaniyên ku destekê didine wê werin qut kirin. Çeteyên DAIŞ’ê sûdê ji rewşa heyî digre û li ser sînorê dewletên herêmê tevgera û êrişên xwe berdewam dike. Ji milekî din ve jî ji ber ku hişmendiya netew dewletên rojhilata navîn naxwaze ku gelên wan zane bibin û xwe birêxistin bikin, ev yek jî dibe sedem ku xwe parastina cewherî nayê dîtin û gel li hemberî hemû zehmetiyên heyî bi tena serê xwe dimîne.

### Dewleta tirk hemû derfet daye çeteyên DAIŞ’ê

Dewleta tirkiyê pêşiya DAIŞ’ê di serî de vekir û bêre hevkarî raste rast kir û sînorên xwe li pêşiya çûn û hatina çeteyên DAIŞ’ê vekir û ji tevahiya cîhanê çeteyên DAIŞ’ê derbasî xaka Sûriyê bûn. Tirkiye xwest bi riya çeteyên DAIŞ’ê kurdan qir bike û hikumeta şamê hilweşîne û li şûna wê ixwan mislimîn bîne ser desthilatiyê. Dagirkeriya tirk ji hemû milî ve Sûriyê talan kir û ji penaberên ku derbasî tirkiyê jî bûne sûd wergirt û ew li hemberî Ewropa û cîhanê tevahî jî bikar anîn. Dagirkeriya tirk û bi riya çeteyên girêdayî wê di roja îro de teroreke cîhanî dide meşandin û li hemberî vê yekê jî kes dengê xwe nake û xeteriya vê yekê nabîne.
Hêzên cîhanî û herêmî her yekî ji van hêzan li gorî berjewendiyên xwe çeteyên DAIŞ’ê bikar tînin û bi hevre jî hevkariyên qirêj û gemar li ser hesabê gelên herêmê didin meşandin. Dagirkeriya Tirk jî heyanî roja îro ji nakokiyên di navbera NATO û Rûsiyê de sûdê digre û li gorî wê tevdigere.
Dagirkeriya tirk dema ku dît heremên di destê çeteyên DAIŞ’ê de yek bi yek ji destê wê derdikevin, di serî de li Kobanê xwest ku bi hemû hêza xwe bi ser bikeve, lê di encamê de û bi berxwedaniya gel kobanê neket û bi saya şervanên YPG û YPJ’ê bi ser ket, li gorî vê yekê hemû pilanên tirkiyê vale derketin. Piştî rizgarkirina bajarê Kobanê ji çeteyên DAIŞ’ê hemleya rizgarkirina gundewarên Kobanê, Minbic, Reqa û dawiyê jî Dêrezorê dest pêkir û bi encam bû.
Dema ku dagirkeriya tirk dît ku bi riya çeteyên DAIŞ’ê nekarî kurdan qir bike û Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagirbike, bi xwe dest bi êriş û dagirkeriyê kir û ji Cerablos, Bab, Ezaz, Idlib, Efrîn, Serê kaniyê û Girê Spî kir. Li wan heremên ku dagirkeriya tik dagir kirine, bi sed hezaran gel bi darê zorê hate koçber kirin, gelek welatî hatin kuştin, girtin, işkence kirin û gelek jin hatin kuştin û tecawiz kirin û sererd û binerdê van hemû herêman hatin talan kirin. Heyanî roja îro jî li wan herêmên ku ji milê dagirkeriya tirk ve hatiye dagirkirin qirkirina gel û xwezayê bê sînor tê meşandin û sûcên dij mirovî û xwezayê têne meşandin.

### Hêzên hegemon û herêmî çeteyên DAIŞ’ê bi kar tînin

Hêzên hegemon ji bona kiryarên ku dagirkeriya tirk li herêmê dide meşandin çavê xwe digrin û binve binve jî pêre alîlarin. Li milekî qaşo bi kurdan û hêzên herêmê re li hemberî çeteyên DAIŞ’ê di nava hevkariyê de ne. Ji milekî din ve jî li hemberî hemû êriş, gef û sûcên dij mirovî yên ku dagirkeriya tik û çeteyên wê dide meşandin dengê xwe nake. Weke ku tê zanîn dagirkeriya rik dixwaze di serî de gelê Kurd qir bike û xweseriya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye îlan kirin û xwe di nava gel de birêxistin kiriye ji holê rake, li tevahiya Kurdistanê jî vê yekê dide meşandin. Her wiha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û piştî binketina çeteyên DAIŞ’ê û rizgarkirina hemû deverên ku ji milê çeteyên DAIŞ’ê ve hatibûn dagirkirin. Ji hemû pêkhateyên herêmê rêveberiyeke xweser hate avakirin û êdî sistemeke nenavendî û hevbeş bi destê gelên herêmê hate avakirin. Lê li hemberî avakirina vê rêveberiyê ji roja destpêkê ve û heyanî roja îro dagirkeriya tirk tehemula wê nîne û bi hevkariya çeteyên DAIŞ’ê û PDK’ê û hişmendiya ntew dewletên herêmê dixwaze hemû destkeftiyên ku bi destê gel hatine pêkanîn ji holê rake.
Di roja îro de jî hêzên hegemon û herêmî jî dizanin ku dagirkeriya tirk sersebebê nearamî û tevlîheviya ku li herêmê û cîhanê tê jiyan kirin e. Her wiha dagirkeriya tirk di serî de çeteyên DAIŞ’ê û hemû hêzên çete hem li Sûriyê û gelek deverên mîna Lîbiya, Ezirbêcan, Nîcîriya û li başurê Kurdistanê li hemberî gelê kurd dide bikaranîn. Kiryarên ku dagirkeriya tirk dike û sûcên dijmirovî li ber çavê cîhanê tevahî dide meşandin, lê kes dengê xwe jêre nake. Her hêzekê li gorî bejewendiyên xwe tev diger û di serî de çeteyên DAIŞ’ê li her devera ku bixwaze bikartîne û dixwaze gelê Kurd tevahî qir bike û hişmendiya xwe li ser cîhanê tevahî serwer bike. Li hemberî vê hişmendiya dagirkeriya tirk ya ku li ser cîhanê tevahî xeteriyeke mezin ava dike û bandora wê ji dîrokê ve heyanî roja îro berdewame. Di serî de gelê Kurd û hemû gelên azadîxwaz li hemberî vê yekê destê xwe bidin hev û her tim di nava kar, xebat û têkoşînê de bin û dawiya hişmendiya faşîst, nijatperest û planên osmanya kevin û ya nû bînin. Her wiha di serî de li Rojhilata Navîn û cîhanê sistema Netewa Demukratîk, kunfedraliya demukratîk û rêveberiya xweser avakirin.

# Partiya Rêkeftinê; Armanc û xebat

Sekreterê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî Fewzî Şingalî anî ser ziman ku Partiya Rêkeftinê partiyeke kurdî- kurdistanî û kurdî- sûrî ye. Herwiha Şingalî diyar kir ku ew ji bo çareserkirina doza kurdî li ser bingeha lihevkirineke siyasî xebata dîblomasî didin meşandin.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî yek ji partiyên siyasî yên kurdî li Rojava ye ku di encama rewşeke siyasî ya hestiyar de hatiye avakirin. Ev partî li ser pîvan û rêgezên siyasî yên taybet, xebata siyasî dide meşandin.
Di dema heyî de 8 nivîsgehê vê partiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li Başûrê Kurdstanê jî hene. Di kongreyê damezirandinê de Salih Sofî yekem sekretêrê partiyê hat destnîşankirin, di kongra duyem de jî Nalîn Qinbir bû sekretêr. Herwiha ji kongreyê 3'an ve Fewzî Şingalî sekretêrê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî ye. Hêjayî gotinê ye ku her 4 salan ev partî kongreya xwe li dar dixe û li gor rêziknameya hundirîn a partiyê xebata siyasî dike.
Têkildarî avabûn û xebata siyasî ya Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî, sekretêrê wê Fewzî Şingalî ji rojnameya me re axivî.

### Avabûn û armanca Partiya Rêkeftinê

Fewzî Şingalî di derbarê avabûn û armanca Partiya Rêkeftinê de wiha anî ser ziman: "Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî destpê weke tevgerekê di sala 2004'an de li Silêmaniyê hate avakirin. Herwiha di sala 2007'an de bi kongreyekê weke partiyekê hate destnîşankirin. Di encama Serhildana 12'ê Adarê ya ku di sala 2004'an de li Rojava rûda Partiya Rêkeftinê ava bû. Piştî ev serhildan çêbû, pêwîstiya kurdan bi tevger û partiyeke nû, rêbaz û hişmendiyeke nû hebû ku were damezirandin. Di rastiyê de wê demê tişta ku me weke kurdên Rojavayê Kurdistanê nikarîbû encameke baş ji wê serhildanê bi dest bigirin. Lewma da ku tevgerek û partiyek siyasî xebatekê ji bo doza kurdî bike hate damezrandin û armanca me ew bû. Ji ber zext û qedexekirina rêjîma Beisê ya wê demê xebata siyasî bi giştî ya tevger û partiyên kurdî bi awayekî veşartî dihat kirin. Ji ber vê yekê jî me di sala 2005'an de li Başûrê Kurdistanê xebata siyasî kir, bi rêkûpêkî û li gorî sîstema hikumeta Başûr û Îraqê, karê dîblomasî yê Partiya Rêkeftinê da meşandin. Herwiha me dest bi derxistina Rojnameya Rêkeftinê bi zimanê erbî-kurdî kir, ev rojname li wir bi fermî bi awayekî mehane dihat derxistin, li Îraq û Başûr dihat belavkirin û hem jî me derbasî Rojava dikirin. "

### Rêbaz û mekanîzma xebata wê

Fewzî girêdayî rêbaz û mekanîzmeya ku Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî li ser bingeha wê xebata dîblomasî dike wiha axivî: "Partiya me sîstema Hemaheng(Sekretêr)- Hemahengî(Ofîsgeha siyasî)- Meclis(Endamên Desteya Navendî) dide meşandin. Di kongireyên destpêk de tenê sîstema Hemahengî û Meclis bû, lê di kongeryê duyem de hate guhertin bû sîstema Hemaheng- Hemahengî û Meclis. Partiya Rêkeftinê yek ji partiyên ku li ser bingeha lihevkirineke siyasî xebat dike, ne lihevkirina îdiylojî û felsefî ye. Partiya Rêkeftinê partiyeke kurdî- sûrî ye, dikare bi ereb, suryan û hemû pêkhateyên Sûriyê xebateke siyasî bide meşandin. Çiqasî ku îdoyolojî, bawerî û raman cuda bin, em dikarin di çarçoveyeke siyasî bighêjin rêkeftinê. Di heman demê de bi hemû aliyên siyasî yên Sûriyê û pêkhateyên wê Sûriyeke demokrat bidest bixin. Di heman demê de rêgeza ku em li ser dineşin, bidawîkirina nakokî û pirsgirêkên heyî di navbera kurdan, partî û tevgerên kurdî de ye. Ev yek jî bi riya lihevkirina siyasî tê pêkanîn, çi dibe bila bibe, Partiya Rêkeftinê hemû pirsgirêkan dide aliyekî, xebata siysî bike û pirsgirêkan çareser bike. "

### Asta xebata siyasî ya partiyan li hember derfeta ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê afrand

Sekretêrê Partiya Rêkeftina Demokratîk a Kurdî ya Sûrî, Fewzî Şingalî têkildarî derfeta ku piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo xebata partiyên siyasî afrand û asta karê dîblomasî yê roja îro tê kirin wiha got: "Bê guman piştî ku aloziya



Sûriyê û di heman demê de jî Şoreşa Rojava dest pê kir, guhertinek di hemû warên jiyanê de li tevahiya Sûriyê çêbû. Di nav geşedanên leşkerî û siyasî, derfetek ji bo me weke partiyên siyasî li Rojavayê Kurdistanê hat çêkirin. Êdî ew zexta ku ji aliyê rêjîma Beisê û dewleta Sûrî ve li ser kurdan, tevger û partiyên siyasî dihat kirin. Ji bo me êdî nema hewce dikir ku xebata xwe ya siyasî bi awayekî veşartî bikin, an jî karê siyasî li derveyî Rojava bikin. Tevhiya partiyên kurdî wisa bûn, piştî şoreşê êdî her partiyekê ofîs û şaxên xwe vekirin. Partiya Rêkeftinê jî wiha em tevlî Rêveberiya Xweser jî bûn da ku bikaribin xebata siyasî bikin ku bikeve xizmeta civakê. Me erka li ser milê xwe kir ya wê demê, ji xwe hejmara partiyên wê demê nêzî 12 partiyan bû. Bi demê re êdî hin bi hin gelekî zêdetir bûn. Li gor derfetê ku di destê me de heye niha, xebata siyasî pêwîst bû xebata siyasî ji wiha xurtir baya. Ji ber ku her çendî xebata siyasî xurt be, em ê ewqasî bikaribin çareseriya siyasî, di çarçoveya kurdî-netewî-kurdistanî û kurdî- sûrî pêk bînin. "

## "Qesabê Şengalê Mesûdê Berzanî"!



**Ahmet Aktaş**

Kovara nûçeyan a THE CRADLE ku navenda wê li Libnanê ye, berî çend rojan ev manşet li kovara xwe danî bû.
Heta nIha li Rojhilata Navîn, bêhtir komkujiyên Israîlê yên li dijî gelê Filestîn deng vedabûn û bi navê QESABÊ SEBRA û ŞATÎLLA Serokwezir Ariel Şaron dihat naskirin.
Di heman demê de li herêma Balkanan jî, navê hinek fermandarên komkujî pêkanîbûn derketin çapemeniyê, hinek hatin darizandin û hatin ceza kirin jî.
Niha, ji bo êrîşên Israîlê yen li ser gelê Filestînê, bi heman karî Serokwezîr Netanyahu mîna Qesabê Xezayê tê bi nav kirin.
Erê, komkujî an qirkerî li kuderê cîhanê pêkhatibin, me jî û herkesên mirovperwer xemdar dikin, lê ya herî nêz û me yekser xemdar dike û xedar birîndar dike, komkujî û qirkeriya bi destê "kesên kurd" pêk hatibin.
Em ne biyanî ne, ji siyaset û kiryarên hinek kesên ji malbata Berzanî û nûçeyên wan ên kujeriyên yekanî û komanî! Ji vê malbatê, navê Mesûd, kurê wî Mesrûr û Biraza/zavayê wî Nêçîr derdikevin pêş.
Erê, berî van kesan navên hinek kesên din jî ji vê malbatê mîna Mele Mustefa û hinek kesên nêzî wan hatin gotin.
Her wiha di kovara The Gradle de, bahsa Dadgeha Herêmiya DYE'yê ya li Washington DC'ê ye dewam dike, ku di vira de jî dibêje "Mesûd Berzanî, bi DEAŞê re li ser ÊZDIYA komkujî pêkanî ye"!
Doza vê dadigehê, bi navê Fona Mexdûrên Kurdistanê ya di bin serokatiya Stephen Studdert ê serşêwirmendê Bush, Reagan û Ford bû hatiye vekirin.
Lewma ev doz û dadigeh giring e û di nava vê dozê de, Mesûd û kurê wî Mesrûr bi tawanên giran, bi sûcên mezin tên destnîşankirin.
Her wiha, di kovarê de cih dide gotinên Mîrza Ismailê Serokê Rêxistina-Navneteweyî ya Mafên Mirova yên Êzîdiyan ku ew jî sûcên van Berzaniyan piştras dike.
Û armanca sereke ya Mesûd, ji vê xiyanetê û bi taybetî bi DAIŞê re qirkeriya Êzidiyan; avakirina dewletek Islamî ye!
Weke mînak; berî çend rojan, Cavit Çaglar ê
wêzîrê kevn ê Silêman Demirel bû, di hevpeyvînek xwe de ya li gel Rojnamevan Cansu Çamlibel, hevalbendiya Mesûd a li gel Dewleta Tirk çawa ji dil e, an jî bi gotina rast 'çawa di nava xiyanetê de vedigevize' zelal diyar dike.
Yek ji guftugoyên Cavit û Mesûd wisa ye:
Dibêje Mesûd ji min re got, " bavê min Mele Mistefa şîret li me kiriye û gotiye 'hûn ti carî bi Seddam bawer nebin, belê hûn bi Tirkan bawer bin, ew dostên me ne"!
Eger rast be(heta nuha kesî ji wan, negotiye ev mirov derewa dike) û Mesûd ev gotin kiri be; ya rast dibêje û bavê wî jî weke wî di nava xiyanetê de bû û jixwe ew jî li ser şopa wî dimeşe, ya derewa dike ku wê wextê jî him xiyanetê bi bavê xwe re dike û him jî xiyanetê bi gelê Kurdistanê re dike!
Êdî şîrove ya gel û raya giştî ye.

# Di bin navê peymana 'ewlehiyê' de welat firotin Tirkiyeyê!

**Di dema dagirkerî û êrişên dewleta Tirk a dagirker de, carek din wezîrê PDK'ê dibin navê lihevkirina ewlekarî û prastinê de, li ser sifreya celadên gelê Kurd rûnişt. Bi celadan re, dibin navê peymana 'ewlehiyê' de rûmeta Iraqê firotin Tirkiyeyê.**

Dewleta Tirk a dagirker, bi awayek eşkere xaka Herêma Kurdistan û Iraqê dagir dike, bi sedan wesayîtên zirxî û leşker rojane vediguhêze Başûrê Kurdistanê. Dewleta Tirk rojane di nav bajar û gundên Herêma Kurdistanê de, komkujiyan dike.
Tevî bêdengiya Hikumeta Herêm û Iraqê, alîkariya raste rast ya PDK'ê, binpêkirin, dagirkerî û talana dewleta Tirk, vê carê dibin navê peymana 'ewlehiyê û parastina ewlehiya welat' de, Wezîrê Derve yê Iraq û nûnerê PDK'ê Fuad Hisên berê xwe da Enqereyê. Fuad Hisên bi şandeya ewlekarî û îstîxbaratî ya Iraqê li ser maseyê dagirkeran, li rexa serokê MÎT'ê û wezîrên şer yên dewleta Tirk,



wêne belav dike.
Ji salên borî cûdatir, dewleta Tirk vê carê bi hevkariya bi PDK'ê re, Iraqê jî xist nav hevkariya ewlekarî û îstîxbaratî ya ji bo dagirkeriya xwe. Civîna yekem ya Lijneya Bilind ya Ewlekarî ya di navbera Iraq û Tirkiyeyê de, di sala 2019'an de, dibin navê 'Xurtkirina bingeha hevkariya leşkerî û îstîxbaratî' de, çêbû. Civîna duyem jî di 19'ê Kanuna 2023'yan de li Enqere bi serokatiya her du wezîrên karên derve pêkhat. Civîna sêyem jî di 14'ê Adara 2024'an de li Bexdayê pêkhat. Civîna çarem di 15'ê Tebaxê de li Enqereyê çêbû. Şandeya Iraqê bi serokatiya Wezîrê Karên Derve yê Iraqê Fuad Hisên ku di heman demê de nûnerê Barzaniye, serdana Iraqê kir. Di civînê de Wezîrê Karê Hindir yê Hikumeta Herêmê Rêber Ehmed û serokê Desteya Heşdî Şeebî Falih Feyaz jî amade bûn.
Li gorî daxuyaniyên her du aliyan, mijara sereke ya civînê mijara ewlekarî û parastinê bû. Civîn di demek wiha de hate kirin, dewleta Tirk dagirkeriya xwe ya li ser xaka Başûrê Kurdistanê gihandiye asta herî jor. Ji xwe çi dema dagirkerî û êriş zêde dibin, civînên bi vî awayî çêdibin.
Çawa Erdogan di 22'yê Nîsana 2024'an de serdana Iraqê kir û bi serokwezîrê Iraqê re gelek peyman îmzekir, piştî wê serdanê dewleta Tirk bi hezaran leşker û wesayîtên zirxî tevî çekên giran veguhest Başûrê Kurdistan û Iraqê.
Li aliyek din dewleta Tirk serweriya xaka Iraqê binpêkiriye û bi kûrahiya 40 kêlometre ketiye nav xaka Iraq û Herêma Kurdistanê. Bi dehan baregehên nû yên leşkerî ava dike û nafikire vale bike. Tevî hemû dagirkerî û destwerdana dewleta Tirk, berovajiyê hemû yasayên navneteweyî ye, lê heya niha jî Hikumeta Iraq û rayedarên Herêma Kurdistanê ti helwestek nîşan nedane û bêdengiya xwe di parêzin. **ROJNEWS**



# Şehîdên şopdarên heqîqetê

Dijminên gelê Kurd li dijî dengê rastiyê û pênûsa azad êrişên xwe dewam dikin. Di encamê de, li ser rêya lêgerîna heqîqet û azadiyê gelek berdêlên giran tên dayîn. Rojnemevan û xebatkarên Ragihandina Azad di rêwîtiya xwe ya ronîkirinê û teyisandina rastiyê de, têkoşînekê bêhempa didin meşandin.

**Roj Mehmûd/Qamişlo**

Rojnemevanên Ragihandina Azad di rêwîtiya xwe ya ronîkirinê û teyisandina rastiyan de, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 13 sal bi têkoşînek gelekî dijwar dagirtin. Dengvedan,afirînerî û berhemên derketine holê bi hêsanî çênebûn. Bedelên gelekî giran hatin dayîn; gelek pêşengên wê bi lehengî gihîştin asta şehadetê, di oxira şopandina heqîqetê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 26 Şehîdên ragehandinê çêbûn.
Derbarê Şehîdên qada ragehandinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hevserokê Yekîtiya Raghanidina Azad Dilyar Cizîrê ji rojnameya me re axivî.
Cizîrî diyar kir ku di nava şoreşa Rojava de, di qada Raghandinê de pêşketineke balkêş hate dîtin, berovajî dema rêjîmê ku raghandineke nûneriya dengê civakê bike tune bû û wiha domand: "Tevî kêmbûna derfetên raghandinê lê xebat baş hate meşandin, ji ber ku pêwîstî hebû. Televizyona Roj TV dezgeheke raghandinê bû bi awayekî veşartî kar dikirin. Pêwistî hebû ku xebatên raghandinê zêdetir bê meşandin û ji bo nifşên nû perwerde bên dayîn û amadekirin li hemberî şerê taybet."
Dilyar Cizîrê da zanîn ku ji destpêka Şoreşa Rojava ve û heta niha 26 rojnemevan şehîd bûn û wiha got: "Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re bi dehan ciwan tevlî xebtên raghandinê bûn û ev qad berfirehtir bû, di heman demê de ji bo derxistina rastiyê gelek rojnamevan şehîd bûn. Ji destpêka şoreşa Rojava û heta niha 26 rojnameva ji bo gihandina dengê şoreşê ji raya giştî û cîhanê re gihaştin asta şehadetê."

### Pêwîste raghandinekê pêşeyî were pêşxistin

Dilyar Cizîrê diyar kir ku ji tevahiya xebatkarên ragehandinê tê xwestin ku rêya şehîdên xwe bişopînin û axaftina xwe wiha qedand: "Dijminê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrîşeke berfireh li dijî raghandina Azad û şoreşê dide meşandin, her dixwazin bi şerê taybet saziyên raghandinê, dezgeh û xebatkarên raghandinê reş bikin û biçûk bixin, ji bo vê jî ji me tê xwestin wek xebatkarên raghandinê ku em di oxira şehîdên xwe de ked û tekoşîna hevalên xwe em hewil bidin vê qadê ber-



fireh bikin û li ser wê ava bikin, îro roj her endamek raghandina Azad bi hemû hêza xwe kar bikin, li dijî şerê taybet yê ku li ser herêmê tê meşandin bibin dengê civaka xwe û destkeftiyên ku bi xwîna şehîdan hatine bidestxistin, pêş bixin. Pêwîste raghandinekê pêşeyî were pêşxistin em di warê pêşeyî de gavan bavên û karibin nûnertiya dengê civakê bikin, ew jî bi tekoşîn û xwezanekirinê tê bidestxistin."

### Navên Şehîdên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û cihê ku lê şehîd bûne wiha ye:

-Nûçegihana Ajansa Hawarê Dilşan Îbiş dema ku di 12'ê Cotmehê de hemleya Hêzên Sûriyeya Demokratîk a rizgarkirina rojhilatê çemê Firatê ji çeteyên DAIŞ'ê dişopand, şehîd bû.
-Rojnameger, nivîskar û şoreşger Seyîd Ifrane di 22'ê Îlonê de di encama kirîza dil de şehîd bû.
- Şîlan Botan (Rîm Xişman) endama çapemeniya YPG, YPJ'ê di 25`ê Nîsana 2017`an de, di encama bomberdûmana balafirên şer ên dewleta Tirk a li ser Çiyayê Qereçox şehîd bû.
- Xerîb Walat (Xerîb Reşo) rojnamevan û yek ji damezrînerên ragihandina YPG'ê
di 21'ê Nîsana 2017'an de, di dema şopandina Pêngava Xezeba Firatê ya ji bo rizgarkirina Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê,şehîd bû.
- Îlon Nohlat (Ronahî Omer) endama çapemeniyê ya YPG, YPJ'ê di 20'ê Mijdara 2016'an de li herêmên Şehbayê di encama bombebarana artêşa Tirk a li ser herêmên Şehbayê de şehîd bû.
- Arîn Cûdî (Ahîn Ibrahîm), di 31'ê Çileya 2016'an de li herêma El-Hawlê ya bajarê Hesekê dema karê rojnamegeriyê dikir, di encama teqîna mayînekê de, şehîd bû.
- Agri Yilmaz (Meryem Mihemed), di 13'ê Nîsana 2015'an de dema ku li gundê Xan Mamed ê Kobaniyê rizgarkirina herêmên Kobanê dişopand, şehîd bû.
-Raywan Zagros (Kadar Xelef), di 21'ê Çileya 2014'an de li gundê



Filistîn ê ser bi bajarokê Cezaa ve dema ku şerê YPG'ê li herêma Cezaa ya Girkê Legê dişopand, şehîd Bû.
-Mazlûm Bakok (Ehmed Saado) di 28'ê Îlona 2014'an de dema ku vekirina korîdora mirovî ya di navbera Rojava û Şengalê de dişopand, şehîd bû.
-Rustem Gilo (Selah Sîdo) di 11'ê Mijdara 2016'an de di encama bombebarana artêşa Tirk a dagirker a li ser herêmên Şehbayê de şehîd bû.
-Aram Jan (Aram Ebdullah) di 2'ê Hezîrana 2016'an de li navçeya Ebû Qelqel di hemleya rizgarkirina Minbicê ji çeteyên DAIŞ'ê de, şehîd bû.
- Bahoz Houran di 1'ê Çileya 2015'an de dema ku şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê di nava bajarê Kobanê de dişopand şehîd bû.
- Mistefa Şukrî di 13'ê Tîrmeha 2016'an de di hemleya rizgarkirina Menbicê de birîndar bû û di 19'ê Tîrmeha 2016'an de li Nexweşxaneya Qamişlo şehîd bû.
- Tolhadan Velat (Ocalan Ehmed) endamê Çapemeniya YPG'ê di 22'ê Çileya 2018'an de di encama êrîşên hewayî yên artêşa Tirk a dagirker li dijî herêma Efrînê dişopand, şehîd bû.
-Mihemed Reşo, peyamnêrê kanala televîzyona ÇIRA TV, di 13'ê Cotmeha 2019'an de li Serêkaniyê di encama bomberdûmana balafirên dewleta Tirk a dagirker de şehîd bû.
-Sead El-Ehmed, nûçegihanê Ajansa Hawarê ANHA yê, di 13'ê Cotmeha 2019'an de li Serêkaniyê di encama bomberdûmana balafirên dewleta Tirk a dagirker de şehîd bû.
- Haqî Bagok (Haqî Hesen) endamê çapemeniya YPG'ê di 25'ê Nîsana 2017'an de di dema bomberdûmana balafirên şer ên dewleta Tirk a li ser Çiyayê Qerçoxê de şehîd bû.
-Ezîz Sînka di çapemeniya Azad dixebitî, di sala 2019'an de li herêma Til Temirê ji ber bomberdûmana dewleta Tirk şehîd bû
-Delovan Gever endama ragehandina YPJ'ê di 2019'an de şehîd bû.
-Fîras Dagh endamê ragehandina YPG'ê di 2017'an de şehîd bû.
- Rewan Kenco (Ehmed Hamo) endamê Çapemeniya YPG'ê di 25`ê Nîsana 2017`an de di dema bomberdûmana balafirên şer ên dewleta Tirk a li ser çiyayê Qereçoxê de şehîd bû.
- Îsam Ebdullah Nûçegihanê ANHA'yê di 20 Mijdara 2022`an de, di dema bombebarana Tirkiyê bi balafirên şer li ser gundê Teqilbeqlê yê girêdayî bajarê Dêrikê de şehîd bû.
- Dylan Olmaz di 13'ê Cotmeha 2019'an de li bajarê Girê Spî di encama bombebarana balafirên şer ên dewleta Tirk de şehîd bû .
-Widad Erdemcî derhênerê belgefîlm e, ku roja 10'ê Cotmeha 2019`an dema mala wî li bajarê Serêkaniyê ji aliyê firokeyên şer ên Tirkiyê ve hat bombebarankirin, şehîd bû.
- Necmedîn Sînan, xebatkarê kanala JIN TV, di 23'ê Tebaxa 2023'an de li ser rêya Qamişlo-Amûdê di encama êrişa balafira bêmirov ya dagirkeriya Tir de şehîd bû.

FENER

## Şam Guh Bide Tirkiyê Dê Pîqinê Di Bin Xwe De Bibire!



**Idrîs Henan**

Geşedanên bi lez ên li herêm û Kurdistanê muhra xwe li şiklê hevsengiya hêzê ya pêşerojê kiriye û diyar e wê carek din ev qad şahîdiya dengeyeke nû ya pala xwe daye rûxandina sîstema kevinperest a netew dewlet, bike. Di heman wextê de dê şahîdiya ji zayîna sîstema demokratîk a bingeha wê felsefeya Netewa Demokratîk a Rêber APO ye re bike.
Bi şerê Îsraîl û Hemasê re rola Tirkiyê ya provaktîf di vê êrişê de ber bi çav bû. Hemû îmkanên xwe di oxira şerekî navbera Îsraîl û Îranê de seferber kiriye. Di bingeha xwe de hewl dide herdu hêzên Îsraîl û Îranê, lewaz bike û posizyona xwe ya ceosiyasî ji dest nede. Lew re jî van geşedanan weke firsend diçewisîne ku dagirkeriya xwe ji başûr û rojavayî Kurdistanê re tekûztir, berfirehtir û mayîndetir bike. Hewl dide astengiyên li pêş pêkanîna Mîsaqa Millî rake û bi tunekirina gelan re erdnîgariya xwe firehtir bike. Ji bo vê yekê bixe realîteyê bi hêzên herêmî yên weke xwe û sixuriya çeteyên Sûriyê, PDK, ENKS û terora Alqayîde û DAIŞ re di nav hemehengî û itîfaqan de ye. Derdê Tirkiyê ew e; jinavbirina projeya gelan a azadî û demokrasiyê, Rêveberiya Xweser e.
Ji ber ku xwedî mîrateyeke qirker e, bi rejîmên firoşkar ên weke Baas li Şam û Bexdayê re li hev dike. Îro ji her kesî bêtir faşîzmê Tirk berê xwe daye lihevkirinan. Itîfaqa xiniz a bi Bexdayê re û xalên wê yên xweradestkirinê û daneyên bi êrişên li ser Dêrazorê re derketine pêş raya giştî, niyetên nepenî û eşkere yên Tirkiyê deşîfre dikin.
Rêveberiya Bakur û Rojhilatî Sûriyê, ji ber ku rêveberiyeke gelan a stratejîk e, baş têgihaştiye van plan, dekûdolabên hêzên dagirkeriyê. Ji ber vê jî du rê danîn ber hikûmeta Şamê û bang lê kir ku hişê xwe di serê xwe ke ku nebe kizotek nav agirê berjewendiyên Tirkiyê li herêmê. Bawer dikim banga herî stratejîk ew bû. Nêzîkatiyên Şamê ji bangên Erdogan ên hevdîtinê re baş diyar dikin ku ti baweriya wê bi Erdogan nîne. Dizane jî wî xwe kuştiye ku têkîliyekê li ser bingeha dijatiya ji projeya demokratîk re ava bike. Lê dîsa jî dizane ku dê ev yek desthilatdariya wê rûbirûyî hêzên demokrasiyê bihêle ku hêza wî nîne kêliyek be jî li ber xwe bide. Dêmekî têvedana rejîma Tirkiyê ji rejîma Şamê re şimitandinek e ku wê dawî li desthilatdariya wê bîne.
Rûdanên li dergeha Ebû Zindên, liv û tevgerên hêzan, reaksyonên aliyan û bertekên derdikevin diyar dikin ku biryareke bi şirîkatiya tevayî aliyên Astana û sûtçiyê pêk tê. Di dirêjahiya wê de jî civîna lîcneya destûrî ya ku Rûsyayê li Bexdayê pêşniyar kiriye heye. Ji ber vê jî, çawa ku zemîn bi itîfaqên bi Îraq û PDK re têye avakirin, îro jî dixwazin bi itîfaq û hevdîtina bi Esad re heman zemînê li Sûriyê bidin avakirin. Ango ji başûr heya rojavayî Kurdistanê xetekî dijatiyê ya qirkirinê were avakirin ku di encamê de projeya Mîsaqa Millî li ser kavilên gorên têkoşîna gelan a azadî û demokrasiyê zindî bibe. Tam ji bo vê jî hişyariyên Rêveberiya Xweser ji rejîma Şamê re hebûn ku neşimite xefka Tirkiyeya ku dixwaze Şamê mîna girzeke êzing di agirdanka xwe de bişewitîne û herêmê di oxira berfirehkirina dagirkeriya xwe de talan bike. Ji bona vê jî pêwîste hikûmeta Şamê haydar be ku dîwarê were avakirin, dê hemû rêyên vegerê qut bike û dê pîqinê bin xwe de bibire.